Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1263 9-Nîsan-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

Kevneşopiyek hezar salî: Cejna Pîr Şalyar

Navenda Nûçeyan

Bi hatina Çarşema yekem a çileyê Zivistanê re welatiyên Hewreman li Rojhilatê Kurdistanê diçine Hewremana Text ji bo pîrozkirina Cejna Pîrşaliyar. Ji beriya cejnê bi rojan welatiyên herêmê xwe ji bo cejnê amade dikin.

Cejna çileyê mezin di sê rojên pêşî yên meha 2'yemîn a sala zayinê de, wek yek ji cejnên Kurdî yên kevnar ku di olên Kurdî yên Yarsanî, Zerdeştî, Êzîdî de her sal bi nav û dengê cuda li Hewraman û Laleşa Nûranî tê pîroz kirin.

Pîr Şalyar

Nîqaşên cuda hene li ser kesayetiya Pîr Şalyar an 'Pîr Şehryar'. Li gorî hin jêderkan navê wî Xwedadadê kurê Camasp e. Wek Pîr Şalyarê Hewramanê navdar e. Ew yek ji pîrên herî mezin ê peyrewên dînê Yarsanî ye. Li gorî van agahî û çavkaniyên yek ji destnivîsên pirtûka Serencamê di paja Dewrên Şahxoşînê de hatiye nivîsandin. Pîr Şalyar di 1006'ê zayinê li Hewramanê ji dayîk bûye. Di dema ciwaniya xwe de berê xwe daye Loristanê û çûye ba Şahxoşînê. Sê salan li wir maye û dû re li ser daxwaza Şahxoşînî vegeryaye Hewramanê û bangxwaziya bîr û baweriya Yarsaniyê kiriye. Di sala 1098'ên zayinî wefat kiriye.

Cejna Pîr Şalyar

Cejn û ahenga Pîr Şalyar li Hewramanê vedigere demboriyeke dêrîn û dîrokî. Kurd wê cejnê pir pîroz û giring dibînin û wek yek ji cejn û boneya kurdiya kevnare dibînin. Her sal li Hewramana Text bi rê ve diçe. Ahenga Pîr Şalyar ku hewramiyan bi xwe jêre dibêjin: "Zemawenû Pîrî" du dem û du pajin ango nîvê zivistan û nîvê Biharê. Nêzî hezaran sale welatiyên Hewreman Cejna Pîrşaliyar pîroz dikin ku yek ji 99 pîrên binav û deng ê Hewreman li serdemê Ola Zerdeştî ye. Welatî di nava 3 rojan de gelek çalakî û pîrozbahiyan lidar dixin û Cejna Pîrşalyar pîroz dikin.

1: Di zivistanê de roja çarşemê ta roja înê didome, li gorî salnameya Kurdî dikeve destpêka meha Çileyê ango sê rojên pêşî yên meha 2'yemîn a sala zayînî destpê dike û 3 roj û 3 şev didome.

2: Di 15'ê Gulanê de her sal vê cejn û ahengê bi navê cejna Komasa yan Komsayê ye li kêleka gora Pîr Şalyarê 3 roj û 3 şev bi rê ve diçe, bi zikir, lava, aheng û govendên, xwarin û vexwarin, şîrînî, gûz, fêkiyên taybet û qûrbanî kirinê didome.

Li ser banên xaniyan, li ber pencerên salonan bi sedan kes li merasîmê temaşe dikin. Di destpêkê de welatî kom bi kom berê xwe didin mala Pîr. Li wê derê li defê dixin, govenda Îrfanî û tewafê dikin, helbest dixwînin.

3 roj û 3 şevan berdewame

Di van 3 roj û 3 şevan de dab û nêrîtên dîrokî yên wek 'Kilaw roçne yan jî Kilaw rojne', qûrbanî kirin, pêjîna xwarina tiştînê, govend û semayên îrfanî, parvekirina gûzên di baxê Pîr Şalyar de, merasîma Kilaw rojne, qûrbanîkirina jalan, şevnîşînî, nimêj û dua, dest gerandin bi dola Pîr Şalyar ango dîdara kewşa çermî ya Pîr Şalyar û pêjîna Kulêre Mejgeyê di nava xelkî de ta sê roj û 3 şevan bi rê ve diçin. Zarok beyaniyên roja çarşemê di komên sê kesî û çar kesî de destpê dikin ta saet 9 û dû re qûrbanîkirina ajalan dest pê dike, êvara roja pêncşemê bi govend, zikirên îrfanî û hetanî sibeha roja înê didome, dû re diçin ser gora Pîr Şalyar û merasîma dua xwendinê bi rê ve diçe.



Ji gelek welatan mêvan beşdarê merasîmê dibin. Tevaya şêniyên Hewreman jî beşdarê merasîma cejnê dibin.

Li gorî hinek çavkaniyan vê ahengê vedigerînin daweta zewaca Pîr Şalyar û Bihar Xanima Şahzadeyê Buxarayê ku Kurdên Hewramî her sal ji bo bîranîn û pîrozkirina wê, aheng, stran, hûzan(şîîr), govend, defjenîn, sirûd û gotinên olî vê cejnê pîroz dikin û bi bîr tînin. Helbet di wê demê de di nav zerdeştiyan de jî du cejn bi rê ve diçin bi navê cejna mîgregan û cejna tîreganê.

Li Hewramanê cejna Pîr Şalar

Niqaşên cur bi cur li ser navê Hewramanê hene, lê piranî peyva Hewramanê ji du pajên 'hûra' anku 'ahûra' û 'man'ê ango der, mal, welat pêk tê. Welatê ahûrayî û welatê pîroz û welatê rojê. Hûr an xûr û xor ango roj û tav. Xelkên Hewramanê bi diyalekta hewramî dipeyvin. Hin ji dîroknasan dîroka vê cejnê vedigerînin hezar sal berê û hinek din jî vedigerînin zêdetirî hezar sal berê. Birêveçûna vê ahenga birûmet a civaka Kurdî û dilsoziyên civakê ji bo çalakiyên çandî, amajeya entelktualî, kenvarî û şaristaniya vê erdnîgariyê û çanda vê civakê şan dide. Di vir de baştir xuya dibe ku peyva 'Pîr' bê sedem neketiye nava rêbaza sofîgeriyê û ev asta pîrîtiyê asta serfiraziya rêwîtiyeke dûr û kûr a rewşenî û ronahiyê ye.

Ronahiya Mîtra û eşq, ronahiya dûrketin ji nefamî û nezaniyê. Ew xwedî pêgeh û wateyeke kûr a Kurdistan û Zagrosê ye. Peyva 'pîr' hêmaya pakî, ronî û behayî ya xwezaperwerî û xwedaperestî ye. Ew di zêhn, ruh û çanda Kurd û Hewramiyan de dijî. Hewraman xwedî, huner, kinc, xwarin, muzîk, fikir, bawerî, çandên taybet in. Mêrên wê rank û çoxe, mişkî, ferencî û jinan jî canî, kulince, şal û şedeyên rengal dipoşin.

Li gorî tê riwayetkirin Pîrşalyar pîrekî ruhanî û xudanas bû. Her wiha yek ji kesên heskirî yê serdema pêxember Zerdeşt bû, ji aliyê gelê Hewraman ve rêzek mezin jêre tê dayîn. Hêjayî gotinêye ku pirtûka wî nîşana kesên biyanî nadin.



FERHENGA BIWÊJAN

Ezê te saqoçermî (yan jî saqoçermo) bikim:
- Ezê te ji dest û ling bixim; ezê wisa bikim tu nikaribî tiştekî bikî. (Dema heywanên bi perr tên pirtikandin dibêjin saqoçermî)

Ezê wisa bikim ku heft rûnin deh qiset bikin:
- Ezê te perîşan, rezîl û riswa bikim; ezê wisa li te bikim ku her kes behsa perîşaniya te bike.

Ezê wisa bikim ku tu navê bavê xwe ji bîr bikî:
- Dema yek reşan dide yekî, gef û guran didiyê wisa dibêje.

Ezê wî kunikî derxim:
- Ezê wî perîşan bikim. (Kunê avê)

Ezê wî basko bikim:
- Ezê baskên wî bibirim; ezî sînorekî ji tevgera wî re daynim.

Guhê guran pê nîşan dide:
- Gefan lê dixwe; reşan didiyê.

Guhê guran nîşanî hev didin:
- Reşan didin hev; zirtan li hev dikin.

Ji we genimê sor ji me simbêlên sor:
- We genimê me şewitandiye emê jî mêran ji we bikujin; we hinek zerer daye me, emê sed qatî wê zererê bidin we.

Keviran di ser de gêr dike:
- Zirtan lê dike; reşan didiyê; gefan lê dixwe.

Kulma himandî ye:
- Gef e, tehdîd e; şûrê demokles e.

Kulma xwe nîşanî da:
- Hêza xwe nîşan da; peyam dayê ku jê natise; hêza xwe derxist meydanê; reş danê.

Ma em bêjin mast:
- Ma em tiştên dizî eşkere bikin; ma em servekirî bêjin; ma tu çima fêm nakî?
Ma ez li binê kundir bixim?
- Ma ez her tiştî eşkere bikim?

Masûlkeyên xwe nîşanî hev dan:
- Hêza xwe nîşanî hev dan; gef li hev xwarin.

Mergê te sê car:
- Dema yek gefan li yekî dixwe hingê jê re dibêje.

Mistên xwe nîşanî hev dan:
- Hêza xwe nîşanî hev dan; gef li hev xwarin.

Mista xwe nîşan da:
- Hêza xwe nîşan da; peyam dayê ku jê natirse; hêza xwe derxist meydanê; reş danê.

Reş danê:
- Xwest bitirsîne; gef lê xwarin; gef û gur danê; tehdîd kir.

Serê xwe lê hejand:
- Gef lê xwarin.

Sondikên wî dixwe:
- Gef û gurran didiyê; reşan didiyê; tehdîd dike.

Tu biçî Bidlîs tuyê her werî ser lîs:
- Tu bi kû ve biçî tuyê dîsa werî cem min; tu nikarî ji ber destê min birevî.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Dayika Uwêyş bi têkoşîna xwe hişt ku têkoşîna jinan zindî bibe

Dayika Rêber Abdullah Ocalan yadê Uwêyş bi perwerde û têkoşîna xwe hişt ku têkoşîna jinan zindî bibe û gelê kurd ji xewa mirinê şiyar bibe. Dayika Uwêyş berhemeke bêhempa diyarî gelê kurd kir û di 11'ê Nîsana 1993'an de ji ber kirîza dil çû ser dilovaniya xwe.**R-5**

'Nameya Rêber Apo perspektîfên xwenûkirin û rêxistinbûnê ye'

Endamê Tevgera Ciwanên Şoreşger ên Sûriyê Dilyar Îbrahîm teqez kir ku nameya Rêber Apo ya ji bo ciwanan perspektîfên jinûverêxistinkirin û bilindkirina têkoşînê ye û got: "Divê ciwanên serdemê layiqê pêvajoyê derkevin."**R-5**

Pirrengiya Sûriyê

Sûriyê di bingeha xwe de xwedî pirrengiyeke olî û entîkî ye. Tê de bi sedê salan netew, ol û baweriyên cuda jiyan dikin. Pirrengiya heyî hişt ku Sûriyê bibe cihê kombûna çand û şaristaniyan.**R-6**

'Festîvala Şehîd Yekta Herekol bilindkirina asta hunerê ya şano ye'

Gezîze Omer û Şiko Omer ku ji Başûr Kurdistanê tevlî 7'emîn Festîvala Şehîd Yekta Herekol bûne diyar kirin ku bi rêya festîvalan ew tecrûbeyên Başûr bi Rojava re parve dikin û gotin, "Festîvala Şehîd Yekta bilindkirina asta hunerê ya şano ye."**R-7**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1263 9-Nîsan-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

WELATPARÊZÊ RAST HUNERMENDEKÎ WÊREK

27'ê Adarê Roja Şanoya Cîhanî ye, herwiha di vê rojê de jî têkoşer Yekta Herekol ku xeta şanogeriyê temsîl dike şehîd bû. Ji bo bîranîna şehîd Yekta û di roja Şanoya cîhanê de, her sal Festîvala Şehîd Yekta Herekol li Rojava tê lidarxistin û bi dehan rewşenbîr, derhêner, şanoger, stranbêj û hwd tê de beşdar dibin. Îsal jî bi dirûşmeya 'Welatparêzê Rast Hunermendekî Wêrek' 7'emîn Festîvala Şehîd Yekta Herekol di 27'ê Adarê de dest pê kir û ji her çar perçeyên Kurdistanê û Sûriyê hunermend beşdar bûn.**R-3**

Yan Neteweya Demokratîk yan jî Parçebûn

Dema ku Sûriyê di pêvajoyeke wêrankirin û veguhertinê re derbas dibe, pirsek bingehîn her ku diçe girîngtir dibe: Gelo şerê bêdawî dê di dawiyê de bi çareseriyek rastîn bidawî bibe? An jî ew ê şahidiya vegerandina rêjîma kevin bi maskeyên nû bike?.**R-4**

Jin ji xwe re xwedayan çêdike — Nehîr Pale R-2
Hewldanên "Xapandina hezar salî" — Farûk Sakik R-5
Tirkiyê li Rojhilata Navîn çavkaniya paşverûtiyê ye — Zekî Bedran R-5
Xeteriyên gelekî mezin li pêşiya me ne! — Rohat Bulut R-6

Dayika Uwêyş bi têkoşîna xwe hişt ku têkoşîna jinan zindî bibe

Dayika Rêber Abdullah Ocalan yadê Uwêyş bi perwerde û têkoşîna xwe hişt ku têkoşîna jinan zindî bibe û gelê kurd ji xewa mirinê şiyar bibe. Dayika Uwêyş berhemeke bêhempa diyarî gelê kurd kir û di 11'ê Nîsana 1993'an de ji ber kirîza dil çû ser dilovaniya xwe.

Amara Baran/ Qamişlo

Rêber Apo di nirxandin û dahûrandinê xwe de gelek caran têkîliyê di navbera xwe û dayka xwe de dinirxîne û wiha dibêje" Bi aliyên xwe yên erênî û neyênî li ser tevgera azadiyê ya jinê, yek jina ku bandora xwe kiriye dayîka min e.

Uweyş Ocalan Kiye

Uweyş Ocalan li Gundê Amarayê yê Xelfetiya Rihayê hat dinê. Di temenê biçûk de bi kesek ji gundekî nêzî wan re tê zewicandin. Kesê ku pêre hatiye zewicandin, hewl dide jineke din birevîne û ji ber ku jina dixwaze birevîne naxwaze pêre bireve wê dikuje. Dayê Uveyş ji vê bûyerê re li dadgehê şahidiyê dike û dibe sedema cezagirtina kesê jin kuştiye. Ew kesê ku li ser îfadeya Dayê Uveyş tê girtin li girtîgehê krîza dil derbas dike û jiyana xwe ji dest dide. Uveyş piştî vê yekê vedigere cem malbata xwe û bi Omer Ocalan ku ji heman gundî bû, re dizewice. Ji vê zewacê sê kur û çar keçên wê çêdibin. Uveyş ji ber nexweşiya şekir li Edeneyê tedawî dibîne, lê dawiyê lingekî wê tê jêkirin. Piştî tedawiya salek a li wê derê di 11'ê Nîsana 1993'an de ji ber krîza dil wefat dike. Cenazeyê wê li gundê Amarayê yê gelek jê hez dikir tê definkirin. Uveyş bi kesayeta xwe ya xurt û bi berxwedana xwe tê nasîn û di 4'ê Nîsana 1949'an de zarokek anî dinê nizanîbû ku ew ê bibe rêberek û çarenûsa Gelê Kurd biguherîne. Uveyş gotinên wekê 'Ji min re kumaşekî fistan bigire' dibêje û li ser vê Abdullah Ocalan wiha dibêje: "Ji bo hêjayî wê bim li gorî min divê ez ji bo Kurdistanê têbikoşiyam. Tevî hemû nakokî û pevçûnan dîsa jî ewladekî baş yê dayikê wisa pêkane."

Rêber Apo: Dayîka min tofanek serhildêriyê bû

"Rêber Apo ji bo dayika xwe dibêje, "Ew tam tofaneke serihildêriyê bû û dizanim ku dayika min têkoşerek mezin e. Di temenê biçûk de têkoşîn fêrî min kir. Hîn jî bandora wê li ser min heye. Dayika min hestek wiha bi min re afirand. Tu xwe bispêrî min, piştgirî û alîkarî ji min bigirî, wisa bi girîn û gazin nikarî bijî. Divê teqez tu bi xwe bersiv bidî. Ev yek dibe sedema hestê xwegihiştin û tolhildanê. Li gund bi serhildêriya xwe dihat nasîn. Li hember kesî serî neditewand. Jin, mêr ferq nedikir, bi ser de diçû, hesab dipirsî. Ji xwe ji ber bandora dayika xwe ez wiha nêzî têkoşîna jinan bûm."

Dayîk îfadeye zayinê ye

Rêber Apo wiha baldikşîne ser rastiya Dayîkî û dibêje" Di Kurdistanê de yek rastiyeke em bikaribin li ser bisekinin jî rastiya dayîkan e. Dayîktî bi giştî îfadeya zayînê ye. Wata herî hêsan ya di nava me de bi şêweya zarokan tîne û nifşê xwe didomîne ye. Min ji serî de ev nepejirand. Dikare were gotin ku, bersiva herî hişk a dayîka xwe min bi xwe da. Ew weke dayîkekê hemû mafê xwe yê malê bi jidayîkbûna min dida pêş. Min jî digot; "tu wê mirîşk û cîcikê dibînî, mirîşk ji bo cîcikê çiqas dayîk e, tu jî ji bo min ewqas dayikî." Ev şibandineke gelek qebe bû, lê min ev kir. Heta ez diketim nav nêzîkatiyeke ku min digot şûna zarokên te wisa hebin bila qet tinebin baştir e. Di vê watê de min nêzîkatî raber dikirin. Ji ber yek ji dayîkan bû, ez jî yek ji wan zarokan bûm. Zarok weke dixwaze najî, dayik jî weke dixwaze bi zaroka xwe re dixwaze xwe bidomîne. Ev nakokî bû.

Dayîka Ûveyş, kêmzane û pêlansazî bû. Lê belê li gor xwe dayîkeke îsyankar bû. Di heman demê de jinek bû ku zêde neketibû bin bandora zilam. Jixwe têkîliyên wê bi min re cûda bû. Di wê baweriyê de me ku dayîka min zêde nedizanebûna ku çi dixwest de bû. Ji bo min wisa difikirî "waye wê bibe karmend, hindek pere qezenc bike, çend metre qumaş, çend cilûberg bikire" bû. Ev hin xwestekên zêde naveroka wan ne dagirtî bûn. Qesda wê ji ewladê bixêr, halê wê hindek ferisandin, di aliyê madî û manewî de hindek bersivdana wê bû. Zarokek di vê wateyê de bersivê dide dayika xwe. Ji bo bibe keça diya xwe an jî kurê diya xwe gelek bi pute (ozen) nêzîk dibin.

Di her tiştî de dijîtî di vir de destpêkir. Hûn bibêjin nebûna zarokekî wisa û cûdatiya vê taybetmendiyê, an jî şens an bêşensî em wisa fêrbûn. Li gor xwe di temenê herê nêz de şerekî wisa ji bo dayîka xwe min da. Ma însan li hember diya xwe şer dike? Me da. Ez gelek kêm ketim rewşa zaroka ji diya xwe gelek hez dike, an dayîka ji zaroka/ê xwe gelek hez dike. Ji bo em wisa bibin ma ev xebata me gelo tewan bû, rastiya we ye, an ya min e? Lê belê psîkolog dibêjin şêwegirtina zaroktî gelek bandora xwe li ser kesayet dike û di mezinahiyê de jî ev bandor didome. Em jî bi vê bawer in. Ev rastiyeke zanistiye. Ew têkoşeriya wê demê nebe, têkoşeriya piştre jî nabe. Gelo ez gelek bi aqilbûm an biryar bixwe gelek cûda bû nizanim, lê têkoşerî xwe ferz kir. Ev jî mijareke cuda ye. Em hesabxwestinê di temenê biçûk de destpê dikin. Hindek ferasetên wê yên serwer jî hene; li gor xwe dixwaze hin kevneşopiyên malbatî hakim bike. Hin xwestekên min ên azadiyê hene, ez jî wan dext dikim. Kevneşopiyên malbatî yên ku ew fêrbibûn. Yên bi navê azadiyê ku ez fêr bibûm, şerê gelek bi rêgez li hemberî desthilatiyê ku pêşdiket bû.

'Armanca me avakirina civakeke demokratîk e'

Dîlan Mulhim\ Qamişlo

Rêvebera Mala Jin ya Bajarê Qamişlo Mebrûka Ibrahîm diyar kir ku di mihê de nêzî 50' î pirsgirêkên jinan tên Mala Jin ku piraniya wan pirsgikên jî pirsgirêkên malbatî ne û got: "Armanca me avakirina civak û malbateke dîmokratîk e"

Bi destpêkirina şoreşa Rojava re, bi armanca rêxistinkirin û parastina mafê jinê, Mala Jin hat avakirin û bû yek ji destkeftiyên şoreşê. Mala Jin bi domana demê re roj bi roj pêş ket û li tevahiya bajar û bajarokên Bakur û Rojhilatê Sûriyê şaxên wê hatin belavkirin. Di dema niha de mala jin hewil dide ji tevahî pirsgirêkên jin û civakê re bibe bersiv û mehane bi 10'an pirsgirêkên malbatan bi giştî û bi taybet yên jinan çareser dike.

Di derbarê kar û xebatên Mala Jin Rêvebera Mala jin ya Bajarê Qamişlo Mebrûka Ibrahîm ji Rojamameya me re axivî.

'Mal Jin xwedî li jin û civakê derdikeve'

Mebrûka Ibrahîm anî ziman ku pirsgirkên civakî piraniya wan yên jin û mêran in û wiha got: "Di mehê de nêzî 50'î pirsgirêkî ji me re tên. Pirsgirêkên ku îro ji me re tên bi giştî pisgirêkên malbatî ne, yên wekî; zewaca temen biçûk ku di vê demê de kêm bûye, jinên ku ji ber işkence û tundiyê ji mal direvin. Herwiha hin caran ji aliyê kesên ne diyar ve li ser mediyayên civakî gef li jinan tê xwarin. Em ji aliyê xwe ve van jinan dikin cihê parastinê heta ku em pisgirêka wan çareser bikin. Çareskirina van pirsgirêkan mala jinê ji her alî ve dibe bersiv û pirsgirêkan çareser dike, kesên ku pirsgirkên wan di mala jin de çareser nebin em wan rêdikin dadgehan."

'Armanca Mala jin avakirina civakeke demokratîk e'

Mebrûka Ibrahîm da zanîn ku deriyê Mala Jin ji tevahiya civakê re vekirîye û waha pê de çû: "Hin jin hene tên gazinên xwe dikin û hin jî ji tên ji bo ku karekî ji xwe re peyda bikin. Civak û jin, Mala Jinê ji xwe re riya çareseriyê dibînin. Herwiha armanca Mala Jinê civak, malbatek wekhevî û dîmokratî e. Dema ku em lihevkirin di navbera jin û mêr de çêdikin. Di heman demê de astengiyê ku em di karê xwe de dibîn ew jî pirsgirêkên jin û mêran in dema ku malbatên

wan mudaxeleyê dikin. "

Rêvebera Mala Jin a Bajarê Qamişlo Mebrûka Ibrahîm eşker kir ku pêwîst e jin xwe azad bike û wiha bi dawî kir: "Divê demê de pêwîst e jin hîn rêxistbûna xwe xurtir bike, herwiha dema ku jineke di malê de tudiyek hate li ser wê berê xwe dibin mala jin, ji ber ku mala jin xwedî lê derkeve. Di heman demê de em bi hêvî ne ku her jin riya xwe nasbikin, ji ber ku tundî li ser wan ne yê kirin."

Ji Pênûsa Jin

Jin ji xwe re xwedayan çêdike

Nehîr Pale

Ji xwe re xweda çêkirin yek ji rêbazê mîtolojî ku dikeve bin xizmeta sîstema baviksalarî de. Ji ber vê yekê têkiliya di navbera xweda û ebid de divê bi hemû ziraviyên xwe were lêkolîn kirin. Mîtolojî, ol, dewlet, iqtîdar û hwd. heyanî ji destê wan hat ev têkiliya di navbera ebid û xweda de ne tenê asayî kirin, nirxekî mezin dane wê û ew pîroz kirin. Ev yek jî bû sedema ku jin têkeve xefka koletiyê de û ew gihand asta ji aliyê zîhnî û ruhî ve nikare xwe ji vê têkiliyê rizgar bike. Berevajî, her tim lêdigere ku wê çawa xwe bighîne pîrozbahiya vê têkiliyê. Jin bê zanebûn xwedayan ji xwe re çêdike û analîz nake ku wê di encama wê de têkeve çi rewşê de. Em dikarin vê mijarê bi pirsa gelo jin çawa xwedayan ji xwe re çêdike, berdewam bikin. Di vir de em ê balê bikşînin ser têkiliya jin û malbatê. Dema ku têkiliyên malbatê û bi taybet têkiliya jin û mêr tê pîroz kirin, derî ji koledariya jinê re tê vekirin. Dayîka ku keça xwe di temenê biçûk de dizewicîne, mînak tê dayîn û wê zîrek dibînin, jina gelek kuran tîne pesna wê didin û jina ser tewandî ji hemû jinan çêtir dibînin.

Jin bi bav, bira û hevjîn ve tê girêdan, difikire ku kesek ji bavê wê çêtir nîne, tu kêmasiyên birayên wê nînin, hevjîna wê taca serê wê ye û kur jî pêşeroja wê ye. Li ser jinê tê ferz kirin ku hemû pirsgirêkên wê bi riya mêr tê çareser kirin. Eger bav tûndiyê li keça xwe bike, zewacê jêre çareserî dibînin, eger hevjîna wê zulmê lê bike yan ew ê vegere bin rehmeta bav û birayên xwe yan jî wê careke dîtir bizewice. Her wiha hinek teoriyên mîna: Zewac pêdiviyekî jiyanê ye, jina nezewicê di malê de ma ye, jina nezewicî be û zarokên wê tine bin bêxwedî ye û gunehe, ev hemû dibin sedema ku jin têkeve nava lêgerên xwedeyan ji xwe re çêbike. Bav û hevjîn gelekî zêde di çavên xwe de mezin dike, di her tiştî de li benda mêr e ku wê biparêze, wê birêve bibe û pirsgirêkên wê çareser bike. Jina ku bav an jî hevjînê wê bimre dikeve rewşa mîna ku ew seqet buye, her tim kêra civakê li ser sukra wê ye û di bin rehmeta şert û mercan de dijî.

Di nava civaka zayendperestî de eger jin her tim xwedayan ji xwe re çêbike, ew ê nikaribe dawî li zîhniyeta mêr bîne, guhertin û veguhertin çêbike. Ya girîng jî li hemberî tûndî, kuştin û komkujiyên li ser jin têne kirin, em ê tenê di hundirê xwe de êş bikşînin. Bertekên demkî ne têkoşîn e. Eger têkoşîn jî neyê kirin gelo wê derfet hebe ku jin di polîtîka de gav bavêje yan jî bibe hêza çareserkirina pirsgirêkan. Gihîştina azadî û civaka demokratîk berpirsyartiyeke ji hemû jinan tê xwestin. Rêxistinkirin, xwe perwerde kirin, têkoşîn kirin, guhertin û veguhertin ji bo jinê şert e.

'Festîvala Şehîd Yekta Herekol bilindkirina asta hunerê ya şano ye'

Gezîze Omer û Şiko Omer ku ji Başûr Kurdistanê tevlî 7'emîn Festîvala Şehîd Yekta Herekol bûne diyar kirin ku bi rêya festîvalan ew tecrûbeyên Başûr bi Rojava re parve dikin û gotin, "Festîvala Şehîd Yekta bilindkirina asta hunerê ya şano ye."

Ronaz Silêman/Qamişlo

Di 7'emîn Festîvala şehîd Yekta de rengê Kurdistanî û Rojhilata Navîn tê diyarkirin. Ji ber ku ji Başûrê Kurdistanê Silêmaniyê û Kerkûkê, ji Ûrmiya Rojhilatê Kurdistanê, Parêzgeha Siwêda, Reqa, Qamişlo û hwd... Tevlîbûna koman pêk hatiye. Êdî gelê Kurdistanê û Rojhilata Navîn bi reng û zimanê xwe li gel hev kom dibin, berhemên wan ên ku di sînorên parçeyên Kurdistanên de sînordar bibûn, roj bi roj li her çar perçeyan tên gernadin û pêşkêşkirin. Ev yek ne bi hêsanî pêk hatiye, lê bi agirê bedena şehîd Yekta Herekol û rêhevalên wî yên fedekar ava dibe. Derbarê tevlîbûna Koma Hevalên Gezîze ya Silêmaniyê û Koma Siyê ya Kerkûkê yên Başûrê Kurdistanê derhênera şanoya Muzîka Sor û lîstikvan Gezîze Omer û Rêveberê Festîvala şanoya Kerkûkê hunermend Şiko Omer ji Rojnameya me re axivîn. Nivîskar lîstikvan û derhênera şanoya Muzîka Sor Gezîze Omer ku ji bajarê Silêmaniyê yê Başûrê Kurdistanê tevlî 7'emîn Festîvala şehîd Yekta Herekol bûye kêfxweşiya xwe anî ziman û wiha got: "Ez tevlî hin şano û rêzefîlmên daramî yê kenalan dibin. Îro jî ez ji bajarê Silêmaniyê yê Başûrê Kurdistanê hatime bajarê Qamişlo û beşdarî çalakiyên Festîvala 7'emîn a Şanoyê ya Şehîd Yekta Herekol bûme. Koma min bi navê "Hevalên Gezîze" ye, ji aliyê koma me ve şanoya "Mûzîka Sor" hate pêşkêşkirin. Ev şano jî, ji nivîs û derhênera min e. Herwiha şano balê dikişîne ser astengiyên ku di jiyana Rojhilata Navîn de bi jinan re rû bi rûyê ye."

'Çîroka şanoya "Mûzîka Sor" ji rastiya jinên Rojhilata Navîn e'

Gezîze Omer tevlîbûna xwe ji 7'emîn Festîvala şehîd Yekta Herekol re bi serbilindahî nîşan da û wiha got: "Serbilindahiyeke ji bo min ku ez tevlî 7'emîn Festîvala şehîd Yekta Herekol bûme. Şanoya "Mûzîka Sor" a ku ji aliyê koma me ve hate pêşkêşkirin ji çîrokeke jiyanî ya rastî ye. Çîroka vê şanoyê jî, ji îlhamên çîroka rastîn ku mamosteyek di heyama 30 salan li benda hizkiriyê xwe bû ku were û hev bibînin. Ev çîrok di sedsala 20'an de li Îranê pêk hatiye. Di dema pêkhatina vê çîrokê de pêşketina tekneolojî pêk nehatibû, tenê bi telîfonên normal têkilî dihate kirin ku tenê ew dengê hizkiriyê xwe bike û rojeke bê ew hev bibînin. Hizkiriyê wê jî, ji rengê sor hez dikir, lewra ew mamoste her roj cilên sor li xwe dikir û hêvî dikir ku hizkiriyê wê bê, lê di dawiyê de hizkiriyê wê nayê. Di heman demê de muzîkjena di çîrokê de qurbanek ji qurbanên civaka mêr-salarî ya Rojhilata Navîn e. Wê jî her dem cilên mêran li xwe dikir û li jiyanê digeriya ku tê de bi rêya alava keman û muzîkê bû. Lê di dawiyê de herdû jin bûn qurbanî ji civaka mêr-salariyê re."

'Di jiyanê de pêwîstî bi bendewariyên mezin heye'

Gezîze Omer eşkere kir ku pêwîst e mirov bi bendewariyên mezin hêvî bike û wiha got: "Bendewarî di jiyana mirov de ya herî dijwar e, ne tenê bendewriya evîndariyê, lê bêndewria dayikan. Bendewariya hêviyê ya pêwîst jî ew e ku em bi tiştên mezin hêvî bikin."

'Festîvala şehîd Yekta bilindkirina asta hunerê ya şano ye'

Gezîze Omer eşkere kir ku ew cara yekemîn tevlî Festîvala şehîd Yekta Herekol dibe û wiha got: "Cara yekeme ku koma me tevlî Festîvala şehîd Yekta Herekol dibe. Niha jî festîval di rojên xwe yên pêşî de ye. Lewra ji bo ku em nirxandinên xwe li ser bikin pêwîst e em wê festîvalê bişopînin û nas bikin û li şanoyên din ên bên pêşkêşkirin, binerin. Lê di destpêkê de li gorî ku em rewşê dişopînin diyare ku felstîvalekî rêxistinkirî ye. Di heman demê de ji bo yekirina gelê kurd, yekirina çandê û bilindkirina asta hunerê ya şano ye. Ev yek jî armanca hemû şangeran ne."

Gezîze Omer

Şiko Omer

'Kerkûk û Rojava tecrûbeyên şanoyê bi hev re parve dikin'

Rêveberê Festîvala şanoya Kerkûkê hunermend Şiko Omer jî diyar kir ku ew armanc dikin tecrûbeyên şanoya Kerkûk û Rojava bi hev re parve bikin û wiha got: "Piştî hevdîtin û lihevkirinên ku di navbera Festîvala şanoya Kerkûkê û Tevgera Şanoyê li Rojava ya di festîvala Mîtan a şanoyê û Festîvala şehîd Yekta Herekol de, em gihiştin xalên lihevkirinê ji bo parvekirina tecrûbeyan. Herwiha parvekirina karên şanoyê ya di navbera herdû festîvalan de ku di her sal û di her festîvalên li Başûr an jî Rojava bên lidarxistin, em pêswazî karên hev bikin. Dîroka van têkiliyan jî vedigere 4 salên bûrî ku gelek hunermend ji Rojava ji bo Festîvala şanoyê ya Kerkûkê hatibûn vexwendin. Em jî weke koma Kerkûkê di sala 2023'an de tevlî Festîvala Mîtan a şanoyê li Şehba bûn. Îsal jî me xwest ji Kerkûkê bi berhemeke şanoyê tevlî Festîvala şehîd Yekta Herekol bibin. Li gorî şopandinên me di vê salê de pêşketinên baş di festîvalê de hatine kirin, ji pêswazîkirina mêfanan, rêxistina festîvalê û hwd...."

'Huner navgîna ragihandina raman, dengê hundirîn û ruh e'

Hêvî Keleş / Qamişlo

Wênesaz û hunermenda kurd Rojîn Hac Hisên anî ziman ku ew hewil dide azadî, xewin, êş û azarên gelên kurd bi pênûsa xwe îfade bike û wiha got: "Huner navgîna ragihandina raman, dengê hundirîn, ruh û asoyane."

Rojavayê Kurdistanê bi wênesaz û hunermendên xwe dewlemendin ku bi saya şoreşa Rojavayê Kurdistanê hewildan ku bi riya hunera xwe êş, deng û xwestekên gelên kurd belavî cîhanê bikin yek ji van wênesaz û hunermend Rojîn Hac Huseyin bi riya tabloyên xwe êş û azara gelên kurd pêşkêşî cîhanê dike.

Rojîn Hac Huseyin ji bajarê Qamişlo yê Rojavayê Kurdistanê ye. Ev 12 sal in li Hewlêrê dijî. Wê ji zarokatiya xwe de, karê hunerî kir û di 14 saliya xwe de li Sûriyê pileya yekem bi dest xist, ew mastera xwe ya endezyariya kompîturê qedand û du salan li ser zanistên hunerî yên razber xwend. Di deh salên şer de tabloyên xwe diyarî Kurdê Rojava kirin. Ew beşdarî gelek pêşangehan bû û li Hewlêr û Silêmaniyê pêşangehên taybet çêkirin.

Derbarê kar, xebat û jiyana wênesaz û hunermenda kurd Rojîn Hac Huseyin ji Rojnameya me re axivî.

'Jin di tabloyên min de cihê xwe digrin'

Rojîn Hac Huseyin diyar ku ew di tabloyên xwe de rengên ekrilîk, Bastîl û zeytî bi kar tîne û wiha got: "Çemento û tiştin ji xwezayê ku ji xeyal û fikir tê di tabloyên xwe de bi kar tînim. Jin di tabloyên min de cihê xwe digrin, ji ber ez wê weke dayîk, welat û buharê dibînim. Rengên min dengbilind, dans û muzîk, weke muzîk û buhara kurdî ya dewlemend e. Min îlhama xwe ji filiklor û mîrata kurdî girt ku weke xalîçeyên pirreng û cil û bergên kurdî, bi rengên bedew ku çavên temaşevan dikşîne bi awayekî ku wî dilxweş û şa dike, ew tarî û gewriya hişê xwe ji holê radike, ew bîskekê di hembêza buharê de difikire. Êş, dîrok û mîrata kurdî ez tînim ber çavan û hewil didim di tabloyên xwe de van tiştan bidim xuyakirin. Min karî di wan tabloyên xwe de bi cesaret û azadî ku dengê wan bighînim cîhanê bi awayekî xweşik û bedew. Hemû tabloyên min karekterê kurdî hildigire, çi ji aliyê rengên min yê germ, sembol yan encamên dîrokî. Herwiha ya ku ez dixwazim ev e ku cîhanek dadperwertir û azadtir biafirînim û êş, zehmetî û xewinên gelên ku jiyanek bikêrtir dixwazin xuya bikim. Karên min ji milekî ve hêsan xuya dike, lê di heman demê de heyanî astekî zehmetiyên xwe hene. Herwiha ya herî girînge ji temaşevan re yê ku xwedî nêrînekî çandî ye û kûrahiya hunerî dikare wan bixwîne û şîrove bike bêyî ku ji ravekirinê aciz bibe û di vir de bedewiya hunerî heye, ku tu parçekî ji ruhê xwe di wêneyek biçûkî bêdeng de hem jî dengbilind de bibîne. Ew bandorek bedew a domdar li ser temaşevan di nav hûrdemên temaşekirinê de dihêle, li vir karê hunerî bi ser dikerve.

'Huner zimanê giyanê min e'

Wênesaz û hunermenda kurd Rojîn Hac Huseyin anî ziman ku heta ku wê wateya êşê nas nekir wê firçe hilneda û wiha got: "Her detayên jiyana min çavkaniya îlhama bi êş bû, ji mal û dibistanê heta kolan û televizyonan, hunermend di bin bandora hemû hestên nakok ên ku li dora wî hene de ye, ji xemgînî û şahiyê bigire heya birçîbûn, şer û neheqiyê. Ji ber ku ez ji malbateke kurd im û di civakeke kurd de jiyan dikim, ez her tim ji bona azadiyê têkoşiyam, çi di warê nasnameya xwe ya netewî de, çi ji aliyê zimanê xwe de, çi ji aliyê mafên xwe yên jinê de. Huner ji bo min ne tenê hobiyek bû, belkî bi min re çêbû û di nav min de mezin bû, ew zimanê giyanê min bû ku min her tiştê nedîtî û nebihîstî bi hunerê anî ziman, min ew veguherand zimanekî dîtbarî ku her kes dikare bixwîne, pê navdar bibe û jê bandor bibe. Ez di wê baweriyê de me ku huner navgîna ragihandina raman, dengê hundurîn, ruh û asoyan e. Ya ku herî zêde hişê min dikişîne pirsgirêkên mirovî ne, bi êş û neheqiya ku tê de ye. Ez di wê baweriyê de me ku huner xwedî hêzek awarte û bandorek a kûr e. Di demên êş û kêfxweşiyê de herdem ez berê xwe didim wênesaziyê weke pingeh ji min re. Ez di wê de hembêza ku min dihewîne û îfadeya tiştê ku bi peyvan nayê vegotin dibînim.

'Wênesazî bû dengê dax wazên min'

Rojîn Hac Huseyin di berdewamiya xaftina xwe de wiha got: "Wek jinek, xebatên min ên hunerî her dem wata jiyana min bû, ji ber vê yekê karaktera jinê di piraniya tabloyên min de bi zelalî xuya dike. Jin sembola xwezayê, biharê, welat û evînê ye. Di dîrokê de jin di nava civakên ku weke partiya herî qels û herî kêm azad de dihatin dîtin de êş kişandine. Lê jinan di serdema me ya îroyîn de hêza xwe ya bi destxistina destkeftiyên mezin îspat kiriye. Azadiya ku ez di jiyana xwe de jê bêpar mabûm, min ew di tabloyên xwe yên piçûk de dît, ku bû yekane pencereya min a ber bi qada bextewerîyê ve. Wêneyê baskên min da ku ez ji sînoran bifirim û bû dengê daxwazên min.

Pirrengiya Sûriyê

Sûriyê di bingeha xwe de xwedî pirrengiyeke olî û entîkî ye. Tê de bi sedê salan netew, ol û baweriyên cuda jiyan dikin. Pirrengiya heyî hişt ku Sûriyê bibe cihê kombûna çand û şaristaniyan.

Lîloz Hisên/Qamişlo

Di dirêjahiya serdeman de, Sûriyê cihê kombûna şaristanî û çandên cihêreng bû. Vê yekê hişt ku ew bibe yek ji welatên ku hewerî zêde etînîk, ol û baweriyên cuda tê de hene li ser asta Rojhilata Navîn. Ev pirrengî civak û çanda welat dewlemend kir, di heman demê de ji ber siyasetên desthilatdaran ev yek bû zemînek ji alozî û nakokiyan re.

Di Sûriyê de her pêkhateyek dîrok û çanda xwe ya taybet digre nava xwe, ev yek dibe alîkar ku nasnameya Sûriyê ya pirrengî çêbibe. Têkiliya di navbera van etînk, ol û baweriyan de jî rê dide ku têkiliyên tevlîhev ên jiyana hevbeş çêbibin, ev jî dewlemendiya jiyana civakî û siyasî ya li welat zêde dike.

Olên li Sûriyê wiha ne:

Muisilman: Piraniya şêniyên Sûriyê Misilmanin, di navbera Sunî, Şî`a, Elewî û Îsmaîlî de tên dabeş kirin. Misilmanên Sunî: Rêjeke bilind ji misilmanên Sûriyê Sunî ne. Ew li seranserî welat, li bajarên mezin weke Şam, Helebê herwiha li deverên gundewarî têne belavkirin, ev yek dibe sedema cihêrengiyeke dewlemend a çandî û olî. Ew bi giranî li pey mezhebê ramana Şafiî ne, ku bandorê li jiyan û kevneşopiyên wan ên rojane dike. Bi ser de jî, belavbûneke eşkere ya sûfîzmê li seranserê Sûriyê heye, ku riyên sofiyan roleke girîng di jiyana giyanî û civakî de dilîze, têkiliyên civakê xurt dike û kevneşopiyên kevnar ên ku vê mezhebê ji yên din cuda dike, nîşan dide.

Misilmanên Elewî: Elewî weke şaxekî Îslama Şîa ya Dozdehê ye, di dîrokê de pêşketin tê de çêbû ku hêmanên taybetî xwe çêkir, ew hêmanên Îslamê, Şîîtî û felsefeya Yûnanî pêk tîne. Ew duyemîn mezheba di Sûriyê de ye. Mezheba Eelewî di sedsala sêyemîn a hicrî de derketiye holê û li herêmên deryayî yên Sûriyê, weke Laziqiyê û Tertûsê, li gel hin herêmên hundirîn ên weke Hums û Hemayê, cih digire. Di dîrokê de, elewiyan roleke berçav di bûyerên siyasî û civakî de li Sûriyê lîstin, nemaze di dehsalên dawî de, ku bi awayekî aktîf beşdarî jiyana siyasî bûn. Ew xwedî mîrateyek çandî ya dewlemend in ku baweriyên wan ên olî nîşan dide û adet û kevneşopiyên bêhempa yên bi sedsalan vedihewîne. Tevî zehmetiyên ku di dirêjahiya dîrokê de pê re rû bi rû mane jî, elewî hîn jî nasnameya xwe ya taybet diparêzin li gorî şert û mercên guherbar ên ku welat têre derbas dibin. Civakên elewî roleke girîng di tevna civakî ya Sûriyê de lîstin.

Îsmaîlî: Ew hindikahiyeke biçûk in, ku li herêmên weke Qedmûs û Mesyaf li gundewarê Humsê û Hemayê kom bûne, xwedî mîrateya çandî ya dewlemend û dîrokek dirêj ve vedigere serdema Navîn, ji hêla kevneşopiyên olî yên yekta ku wan ji mezhebên din ên îslamî vediqetîne, ji bilî tevkariya wan a kevneşopî û çalakiyên wan ên di warên bazirganî û hunerî de, têne cûda kirin li wan herêman.

Şî`a: Ew rêjeyek kêm ji şêniyan pêk tên, bi giranî li Şamê û hin deverên din wek Heleb û Laziqiyê têne dîtin, piştî hevpeymaniya Sûriyê bi Îranê re piştgiriya wan zêde bû, ji ber ku vê hevkariyê bandoreke girîng li ser rewşa wan a civakî û siyasî li welat kir, hişt ku zêdetir beşdarî helwêstên xwe yên siyasî bibin.

Xiristiyan: Ew kêmjimarek mezin temsîl dikin, û di nav Ortodoks, Katolîk, Ermenî, Protestan û yên din de têne belav kirin, ev kom bi hev re mozaîkek dewlemend a çand, adet û kevneşopiyan pêk tên. Mezhebên wan ên cihêreng li deverên deryayî û hundir belav bûne, nemaze li deverên wekî Wadî el-Nasara li gundewarê Humsê û çiyayên Qelemûn. Civaka Xiristiyan hewl dide ku mîrateya xwe ya çandî û olî biparêze di çarçoveya zehmetiyên hevdem. Her mezhebek taybetmendiyên xwe yên wek rêûresm û şahî hene, ku dibin sedema xurtkirina nasnameya kolektîf. Di nav mezhebên Xirîstiyanî Ortodoks ên Rojhilatî, Katolîk, Suryan û yên din, civakên Xiristiyan pêkhateyek bingehîn a tevna civaka Sûriyê ne, ku diyaloga navbera olan dewlemend dike û ruhê jiyana hevbeş a aştiyane di navbera komên cuda de pêş dixe.

Durzî: Mezhebeke olî ya serbixwe ye, li deverên taybet li başûrê Sûriyê kom bûye, piraniya wan li Çiyayê Durzî li Siwêda ne, ku navendeke dîrokî û çandî ya vê mezhebê ye tê dîtin. Druzî bi kevneşopiyên xwe yên cihêreng û felsefeya olî ya ku li ser têgîna yekxwedayîtiyê disekine, di nav xwe de bi têkiliyên civakî yên xurt têne nas kirin. Durzî di heman demê de taybetmendiyên xwe yên çandî diparêzin bi nepejirandina endamên nû di nav civata xwe de, dihêle ku bibe mezhebek girtî. Di dîrokê de Durzî di nakokiyên siyasî yên herêmê de rolek girîng lîstine, û di dirêjahiya serdeman de nîşan dan ku ew dikarin di bin şert û mercên cûda de jiyana xwe berdewam bikin.

Cihû: Civakên Cihû yên kevnar li Sûriyê hebûn, lê piştî şerê Nakba û Naksa, piraniya wan koçber bûn, ku ev yek bû sedema ku yên mayî

kêm bibin heya ku hejmara wan tenê bû çend sed.

Êzdî: Komên biçûk ên kurdên Êzîdî li kantona Cizîrê û gundewarên Efrînê jiyan dikin. Di dirêjahiya sedsalan de, êzîdî rûbirûyî gelek zehmetiyan bûne, di nav wan de zordarî û komkujî ku bû sedema belavbûna wan li deverên cuda li seranserê cîhanê, bi taybetî li welatên cîran. Tevî zehmetiyên ku jiyan kirin nasname û mîrasa xwe diparêzin.

Cihêrengiya etnîkî di Sûriyê de

Pirrengiya Sûriyê ne tenê bi aliyên mezhebî ve sînordar e, lê cihêrengiya etnîkî jî di nav xwe de digire. Ereb piraniya nifûsa welat pêk tînin û li seranserê Sûriyê belav bûn.

Kurd: Kurd bi hezarê salan li ser xaka Sûriyê jiyan dikin, beriya derketina dewletên modern li van deveran. Kurd beşeke bingehîn a mîrateya çandî û dîrokî ya herêmê temsîl dikin, di dewlemendî û cihêrengiya nasnameya Sûrî de cih digirin. Di dirêjahiya dîrokê de, kurd rastî gelek çewisandin û koçberkirinê hatine, ji ber hewldanên parastina nasnameya xwe ya çandî û zimanê xwe. Van serpêhatiyên bi êş îradeya wan lawaz nekir, lê xwesteka wan a têkoşîna ji bo mafên xwe yên çandî û siyasî xurt kir. Wekî din kurd beşdarî gelek tevgerên civakî û siyasî yên ku ji bo bidestxistina edalet û wekheviyê li herêmê bû, ev yek bû sedema alozkirina nakokiyên herêmî û navneteweyî yên li ser mijarên nasname û serweriyê.

Di dema rêjîma Baas de erdên kurdan hatin desteserkirin û li ser ereban hatin dabeşkirin, bi mebesta "erebîkirina" herêmên kurdan.

Ermenî: Ku ji Ermenîstana dîrokî ne, ew jî beşek ji tevna neteweyî ya Sûriyeyê ne, di sala 1915`an de bi hejmarên mezin koçber bûn bi sedema komkujiya ku dewleta Osmanî der heqê wan pêk anî. Piraniya ermenî ji ola Xisristiyanî ne û zimanê wan yê taybet heye. Hejmara wan beriya 2011`an derdora 100 hezar bûn, piraniya wan li Helebê bi cih bibûn, wekî din li deverên mîna Keseb, Yeqûbiyê, Qamişlo, Kobanê, Dêra Zorê û Şamê dabeş bûn.

Şerê Sûriyê bandoreke li hebûna Ermeniya kir, hejmara ermenê ku koçberî Ermîniya bûn sala 2015`an gihat 15 hezarî.

Tirkmen: Tirkmen di sedsala 11`an de gihaştin axa Sûriyê, Iraq û Îranê. Li Sûriyê tirkmenên ku ji etnîsîteya tirk in, bi giranî li bakur, li herêma Çiyayê Tirkmenan li Laziqiyê li nêzî sînorê Tirkiyê herwiha li Heleb, Idlib, Hums, Tertûs û herêma Şamê ne. Di bin desthilatdariya Esed de, nivîsandin û axaftina bi zimanê Tirkmenî qedexe bû û hikûmetê nasnameya wan a etnîkî nas nedikir.

Çerkez: Eslê Çerkezan vedigere Kafkasyayê, di sala 1878`an de gihîştin Sûriyê û li wir li sê herêmên sereke bi cih bûn, Quneytera, ku koma herî mezin ji wan beriya dagirkirina Colanê ji hêla Îsraîlê pêk dihat, herêma Helebê û bajarê Şamê û hin gundên derdora wê. Çerkez misilmanên sunî ne.

Pirrengiya mezhebî ya Sûriyê beşeke bingehîn a nasnameya wê ye. Ji nû ve avakirina paşeroja Sûriyê pêwîstî bi parastina vê cihêrengiyê heye û ji bo veguhertina wê ji cihê nakokiyê bibe çavkaniya hêz û pêşketinê. Têgihîştina kûr a cudahiyên di navbera mezheb, kevneşopî û çandên cihêreng de dikare bibe alîkar ku hevgirtina neteweyî xurt bike, ku bihêle her kes bi awayekî aktîf beşdarî avakirina civakek aştî û rêzgirtina ji hev; bibin. Ji bo pêşxistina diyaloga di navbera civakan de û peydakirina platformên danûstendinê, da ku karibin parçebûna dîrokî derbas bikin û pêşerojeke domdar ku mafên hemûyan misoger bike û aştiyê pêş bixe ava bikin.

Xeteriyên gelekî mezin li pêşiya me ne!

Rohat Bulut

Mirovê ku ne di ferqa hebûn, erk û berpirsyariyên xwe yên di nav civakê de be zehmet e ku ji bo paraştin û pêşvebirina civakê tişetkî qenc bike. Beriya her tiştî pêwîste ku mirov xwe, hebûna xwe, armanc û sedemên xwe yên jiyanê baş bizanibe. Li gel vê di warê hiş, hişmendî, piskolojî û sosyolojiyê de serwerî û nasîn divê hebe. Her wiha nasîna zindîwaran, cîhan û gerdûnê ji bo me mirovan gelekî girîng e. Pêşketina çandî, zimanî, civakî, paraştinî û jiyana ber bi aramî û azadiyê ve di aşta şoreşê de tê dîtin û nirxandin.

Dema em bala xwe didinê di tevahiya gerdûnê de pergaleke rêxistinî, displînî û jiyanî heye. Her ştêrk û gerştêrk ku cîhana me jî têde ji derveyî vê pergala rêxistinî û displînî ya heyî nikare tev biger û tişetkî wiha jî ne pêkan e. Başe heke mirov jî wekî proto gerdûn mirov bihesibîne û bi wê hişmendiyê tevgerînekê lê bar bike, ya raşt berpirsyariyeke mezin dikeve ser milê mirov. Lewere mirovê ku proto gerdûn bê hesibîn di heman demê de endamekî civakê ye û civakbûnê pêk tîne. Di nav civakê de jî xwedî riştekе girîng e.

Rişta sereke bi exlaqî, çandî, rêxistin û displînî tevgerîn e. Pîvan û rêgezên sereke yên mirovî jî bi displînî dikare hêmayên civakbûnê biparêze û pêşve bibe. Kes di nav civakê de nikare bi serê xwe bijî û tevbigere. Lewre pîvan, rêgez û hêmayên ku civakbûnê ava dike destûr nade ku her kes li gorî serê xwe tevbigere û rê li ber hilweşîna civakbûnê vebike. Wekî mînak; di pergala gerdûnê û ya ezmanî de ştêrkek dikare li gorî serê xwe tevbiger e? Na. Heke roj bibêje, "Ez bi vê cihê xwe qayil nabim û ezê cihê xwe biguherim" gelo dê çi bibe? An jî cîhana me bêje, "Ez nazîvirim" gelo dê çi bibe? Em wekî mirov li ser wana çiqasî difikirin? Başe, wê demê divê em li ser pergala gerdûnê, jiyana zindîwaran û heyîna civakbûna mirovî baş bizanibin.

Heke em jî di nav civakê de ne bi displînîn û rêxistînîbin dê rewşa me gelekî xeternak be. Jixwe heyîna civakê li ser vê bingehê ye. Ya raşt bijarteyeke din a mirovan ji derveyî civakbûyînê jî tune ye. Mirovên ne civakî be dê hebûna wî jî nebe.

Belê mirov di nav malbat û civakê de dijî! Lê belê gelo xwe dide jiyîn, an jî hema jiyaneke bê pîvan dijî?

Her çi dibe bila bibe pergaleke civakî ya ji displîn û rêxistînî pêktê û jiyaneke çandî û exlaqî heye. Derketina ji derveyî van pîvan û rêgezan di nav civakê de jiyan nabe û nayê qebûlkirin. Ev rewş ji destpêka pêşketina hiş û hişmendiya mirov û civakî vir ve wiha ye. Di serdema me ya niha de nabe ku kes van rêgez û pîvanên civakî binpê bike û rê li ber rizîna civakê vebike.

Ji ber vê yekê gelekî girîng e ku mirov her tim di ferq û girîngiya civakbûyînê de be û li gorî wê tevbiger e. Bi taybetî jî wekî gelê Kurd divê em xwe ji hemû xeteriyên li dijî civakbûnê biparêzin û têkoşîna vê yekê bidin. Naxwe di sedsala 21'emîn de xeteriyên gelekî mezin li pêşiya me ye. Ya raşt bi hev re jiyana me nebe civakbûna me. Lewma jî ya pêwîst ew e ku em li ser vê rewşê baş raweştin û bergiriya xetereyan bikin.

Welatparêzê rast hunermendekî wêrek

Yekta Herekol festîvaleke şanoyê ye, di raman û bingehê xwe de lîstikên curbecur ên şanoyê tên pêşkêşkirin, herwiha derfeta naskirina şarezayên nû yên di warê şanoyê de li seranserê Kurdistanê dide. Bê guman, ev mihrîcan ji bo pêşxistina çanda hunerî û hem jî pêşketina jêhatîbûnê sûdê dide warê lîstikvanî û şanoyê.

Argêş Vîyan/ Qamişlo

Festîval bi pêşengtiya Tev-Çand, Tevgera Hîlala Zêrîn û Desteya Çandê, Nefel Prodiksiyon ya Herêma Cizîrê ji bo bîranîna şanogerê Kurd şehîd Erdogan Qehreman (Yekta Herekol) û şanoger Cuma Xelîl (Bavê Teyar) yê ku Bendava Tişrînê şehîd bibû tê lidarxistin.

Salên derbasbûyî zor û zehmetî derketin ji gef û êrîşên dewleta Tirk ya dagirker, bi hêz û germahiyekê her sal li Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Huner a li bajarê Qamişlo ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê 7'emîn Mihrîcana Yekta Herekol a Şanoyê di bin dirûşmeya "Welatparêzê rast hunermendekî wêrek" bi amadebûna bi gelek ji endamên çand û huner, şanoger û kesayetên rewşenbîr, listîkvanên sînema û welatiyên heremê destpê kir. Hêjayî gotinê ye ku ev mihrîcan li ser asta Kurdistanê tê lidarxistin û dê 6 rojan bi pêşandana 11 şanoyan berdewam bike. Di heman demê de şanogerên ku Başûr, Rojhilat û bajarên Sûriyê yên din hatibûn şanoyên xwe pêşkeş kirin. Her sal bi dûrişmeyekê cûda li bajarê Qamişlo Navenda Çanda Mihemed Şêxo tê lidarxistin. Di bingeha mîhrîcanan de semîner û nirxandinên şanoyan tên kirin. Mîhrîcana 7'emînde Navenda Çanda Mezopomtamya jî şano tên pêşkêşkirin. Navenda Çand û Hunerê ya Mezopotamya berê demê desthilatiya Baas'ê de weke navenda wan yên leşkerî dihate karanîn bû. 11'ê Nîsana 2025'an dê mihrîcan bi dawî bibe. Hêjayi bibîrxistinê ye ku salên derbasbûyî de, komên şano ji ber êrîşên dewleta Tirk ya dagirker nekarî bûn, tevlîbûna xwe ji bona mihrîcanê pêk bînin ev sal derbasî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûn.

Festîvala şehîd Yekta Herekol ya 1'emîn (27'ê Adar 2015)

Mihrîcana binavê şoreşger û şanogerê mezin Yekta Herekol (Erdogan Qehreman) 27'ê Adara 2015'an li bajarê Qamişlo Navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo cara yekemîn hat lidarxistin. Salê destpekê jî gelek şanoger bi şanoyên ku nîvîsandi bûn tevlî mihrîcanê bûn. Di sala destpekê de, şanoyên hatibûn pêşkêşkirin zimanê Kurdî bûn û 2 komên şanoyê li Başûrê Kurdistanê tevlî mihricanê bûn.

Festîvala şehîd Yekta Herekol 2'emîn (27'ê Adara 2016)

Di sala duyemîn de jî, ji heman bingehê şano hatin pêşkeşkirin û dîsa weke cih Navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo hat lidarxistin. 10 şano hatin pêşkeşkirin û gelek şanogerên ji derve û biyanî sala duyemin de jî tevlîbûna xwe çêkirin. Bi zimanê Kurdî şano hatin pêşkêşkirin.

Festîvala 3'emîn şehîd Yekta Herekol (27'ê Adara 2017)

Sala Sêyemîn de jî, bi coş û kelecanekî mezin mihrîcan hat lidarxistin. Gelek mêvan ji wê demê jî tevlî bûn, lê piranî şanoyên hatin pêşkêşkirin zimanê Kurdî bûn. Şanogerê bi Elmanya beşdar bu şanogerê Kurd yê binavê Kawa Şêxî.

Festîvala şehîd Yekta Herekol ya 4'emîn (27'ê Adara 2019)

Ji ber êrişên dewleta Tirk a dagirker li ser kantona Efrînê (2018) mîhrîcan wê salê nehat lidarxistin. Di sala pey wê de (2019) mîhrîcana 4`emîn hat lidarxistin. Lê piştî rizgarkirina herêmên berfireh ji axa Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji çeteyên DAIŞ`ê, şano bi zimanên kurdî û erebî hatin pêşandan û komên şanoyê yên li ser asta herêmê beşdarî bûn.

Festîvala şehîd Yekta Herekol ya 5' emîn (27'ê Adara 2021)

Di 2020`an de jî, ji ber belavbûna şewba Koronayê li gelek herêmên cîhanê, mîhrîcan dîsa nehat lidarxistin. Di 2021ê de mîhrîcana 5emîn pêk hat û gelek şanoger dîsa nekarîbûn tevlîbûna xwe ji ber êrîşên dewleta Tirk ya dagirker pêkbînîn. Şanoya "Venasîn" ya Koma Serdemê ya girêdayî Hêzên Xweparastinê hate pêşandan. Nivîskarê şanoyê Umran Yûsif, amadekar Idrîs Şêxmûs û derhêner Mihemed Resûl bû.

Festîvala Şehîd Yekta Herekol ya 6'emîn (27'ê Adara 2023)

Di salên berê de li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bû, lê di salên dawîn de êdî li ser asta Kurdistanê hat lidarxistin.

Festîvala şehîd Yekta Herekol

Mihrîcana Şano Şehîd Yekta Herekol ya Şano ya 7'emîn (27'ê Adar 2025)

Ş "Hevalên Gezîze" Yekta Herekol ji bo beşdarî 7. Festîvala Şanoyê bibe ji bajarê Silêmaniyê yê Başûrê Kurdistanê hatin bajarê Qamişlo. Komê şanoya "Ask Mûzîka" li dar xist. Derhêner, nivîskar û Lîstikvana şanoyê Gezîze Omer di vê lîstikê de balê dikişîne ser astengiyên ku jin di jiyanê de rû bi rû dimînin. Mîhrîcan îsal ji aliyê Tevgera Çand û Hunera Demokratîk a Mezopotamyayê û Komuna Şanoyê ve bi dirûşma "Welatparêzê rast hunermendê wêrek e" tê sazûmankirin. Çalakiyên Mihrîcanê di 27ê Adarê de dest pê kiribûn, lê ji ber betlaneyên Remezanê û Ekîto ji bo 4ê Nîsanê hat paşxistin. kom ji bajarên Sûriyê beşdarî festîvalê dibin. Her roj dê 2 şano bên pêşandan û semînerek bê dayîn. Semînera yekem bi sernavê "Derbasbûna ji dergehê sehnê û rexneyê" ji aliyê Ehmed Mekaratî ve hat dayîn, semînera duyem bi sernavê "Giringiya gihandina şano bo kes û civakê" ji aliyê mamosta Rêzan Salih ve û simînara sêyem jî bi sernavê "Giringiya ronahiyê, zanistiya rengan û beşên wan" ji aliyê mamoste Mein Diwêir ve hat dayîn.



Di çarçoveya Mihrîcana Şehîd Yekta Herekol de, roja duyemîn de ji aliyê komên Qamişlo û Siwêdayê 2 şanoyên bi navê "Parenoya" û "Îcar" hatin pêşkêşkirin. Di şanoyan de bal kişandin bi ser bandora fikra civakê li ser ciwanan û dayikên ku her dem daxwaza aştiyê dikin.

Bernameyên Mihrîcana Şano Şehîd Yekta Herekol ya Şano ya 7'emîn (27'ê Adar 2025)

Di 27'ê Adarê de festîval hat vekirin û axaftina mêvanan hatin kirin.

Roja duyem 5'ê Nîsanê
Navê Komê û Şanoyê: Çiya, Wêne
Nîvîskar: Sema Zîlan
Derhêner: Simko Cûdî
Navê Komê û Şanoyê: Hevalên gezîze, Mûzîka sor
Nivîskar: Gezîze Omer
Derhêner: Gezize Omer
Roja seyemîn 6'ê Nîsanê
Navê Komê û Şanoyê: Koma Şehîd Osman, Paranoya
Listîkvan: Dilcan Oso
Nivîskar: Ebas El Hayik
Derhêner: Mihemed Umer
Navê Komê û Şanoyê: Koma Rêvebirina Çandê, Îcar
Nîvîskar: Elî Ebdilnebî Zadî
Derhêner: Meen Diwêir
Roja çaremîn 7'ê Nîsanê
Navê Komê û Şanoyê: Koma Şano, Henîn
Nîvîskar: Ebas Elhayik
Derhêner: Ebd Elrehman Brahîm
Navê Komê û Şanoyê: Koma Reqa ya Huner ya Şanogeriyê, Komidîya 7 rojan
Nîvîskar: Elî Ebdilnebî El Zûbeyd
Derhêner: Ebdilqadir ebûd
Roja pêncemîn 8'ê Nîsank
Navê Komê û Şanoyê: Renîm,Bê belge
Nîvîskar: Ebas Elhayik
Derhêner: Kamîran Caro
Navê Komê û Şanoyê: Siyê Ez û tu 9 meh
Nîvîskar: Qasim Ebd Elstar
Derhêner: Qasim Ebd Elstar
Roja şeşemîn 9'ê Nîsanê
Navê Komê û Şanoyê: Koma Argeş, Spîro
Nîvîskar: Erşak Raûf Gonbedî
Derhêner: Maêde Darlekî
Navê Komê û Şanoyê: Teatra Hinar, Yek Fîşek
Nîvîskar: Sebah Elî Enbarî
Derhêner: Şevzan Fewaz Mehmûd
Amadekirin û werger: Mihemed Eşref
Roja heftemîn 10'ê Nîsanê
Navê Komê û Şanoyê: Şehnazê
Nîvîskar: Welîd Omer
Derhêner: Welîd Omer
Roja heştemîn 11'ê Nîsanê
Girtina Bernameyê û belavkirina xelatan

Yan Neteweya Demokratîk yan jî Parçebûn

Sînan Cûdî

Dema ku Sûriye di pêvajoyeke wêrankirin û veguhertinê re derbas dibe, pirsek bingehîn her ku diçe girîngtir dibe: Gelo şerê bêdawî dê di dawiyê de bi çareseriyek rastîn bidawî bibe? An jî ew ê şahidiya vegerandina nîzama kevin bi maskeyên nû bike?

Serhildanên gel ên ku di sala 2011'an de dest pê kirin, ne tenê îfadeya hêrsa li dijî rejîmê bû, di heman demê de dengê lêgerîna azadî, piralî, wekheviya civakî û demokrasiyê bû. Lêbelê, bi demê re, ev lêgerîn bi şerên wekaletê yên hêzên herêmî û cîhanî û berfirehkirina îdeolojîk a pêkhateyên îslamî yên radîkal re rû bi rû ma. Rêxistinên selefî yên wek HTŞ wekî "rêveberiyek alternatîf" nîşan dan ne çareserî ye. Di vê rêveberiya nû ya tekîtî û navendî esas digre de pêkhateya gelên Sûriyê ya pir nasname û pir-çandî nîne. Lê rastiya Sûriyê ev e ku Ereb, Kurd, Asûrî, Tirkmen, Durzî, Ermenî û gelek komên din; Pêkhatineke civakî ya pir-qatî ye ku baweriyên cuda yên weke Sunnî, Elewî, Xiristiyan û Êzidî bi hev re dijîn. Înkarkirina vê tevneyê, tê maneya zîhniyeta ku bû sedema şer bixwe de israrkirin e. Sûriyeyeke nû wê çawa pêkwere? Digel ku gelek vebijêrkên berdest rûyên cihê yên otorîterîzmê temsîl dikin; Dibe ku çareserî di modêleke din a ku di nava şer de pêşketiye lê têra xwe nayê nîqaşkirin de bê dîtin; modêla Neteweya Demokratîk de.Ev avahiya ku bi salan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê (Rojava) û Bakurê Kurdistanê gav bi gav hatiye avakirin e. Armanca wê ew e ku demokrasiya rasterast li ser bingeha meclîsên gel, azadiya jinê, pirrengiya çandî, hesasiyeta ekolojîk û edaleta civakî li hev bîne. Modêla Neteweya Demokratîk weke dijberiya paradîgmaya netewe-dewleta klasîk derket holê. Di eslê xwe de, li dijî nêzîkatiya ferzker a modernîteyê ku bi kurtasî "yek netewe, yek ziman, yek al" tê binavkirin, rêxistineke civakî ya piralî û bervarî ku mirov bi nasnameyên xwe bi hev re bijîn, pêşniyar dike.

Modêla Neteweya Demokratîk di wateya klasîk de ne projeya dewletbûnê ye. Di vî warî de, dibe ku di nihêrîna pêşîn de ji bo gelek kesan nepratîk xuya bike. Lê belê, hêza rastîn a modêlê ev e ku ew ne ji têkçûnek radîkal, lê ji berhevkirina bersivên civakî yên li ser hewcedariyên rastîn çêbûye. Pratîkên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tên jiyîn nîşan didin ku modêl tenê di asta teorîk de namîne; Ev nîşan dide ku ew formek jiyanê ya ku di şert û mercên şer de jî dikare were avakirin. Bi taybetî pergala kantonê, rêveberiya meclîsê û rola diyarker a jinan di warê siyasî û civakî de bingehên vê paradîgmayê ne.

Wek mînak li navendên wekî Qamişlo, Dêrik, Reqa û Dêrazorê, gelê Ereb, Kurd û Suryanî bi nasnameyên xwe beşdarî meclîsên herêmî dibin; Perwerdeya bi zimanê dayikê û jiyana pir olî û pirçandî bi biryarên hevpar tên parastin. Ev rewş, li şûna serweriya navendî û polîtîkaya nasnameyê ya ferzkirî, formeke civakî ya li ser bingeha rêxistinbûna bervarî û ji komên dildar pêk tê pêşniyar dike. Aliyê herî bihêz ê vê nêzîkatiyê ew e ku ji bo civak ne "mafê temsîliyetê" lê "mafê biryarê" dide. Bi gotineke din, ne tenê temsîliyeta sembolîk, di heman demê de beşdariya rastîn esas tê girtin. Li welatekî weke Sûriyeyê ku gelên cuda di dîrokê de hatine tepisandin û nasname bi asîmîlasyon û tundî hatine tepisandin, ev pêşniyar radîkal e, lê realîst e. Ji ber ku şer bi xwe berhema van dûrketin û yekperestiyê ye.

Di vî warî de şerê niha li Sûriyê ne tenê şerê çekan e, şerê modêlan e jî. Li aliyekê komên cihadî yên ku dezgehên dewletê yên navendîparêz, otorîter diparêzin û dixwazin civakê bi pêkhateyên teokratîk, şerîet û mezhebî ji nû ve dîzayn bikin hene û li aliyê din jî modêla Neteweya Demokratîk ku bi şer û bêşên mezin ji rejîmê û opozisyonê rewatiya xwe li ber çavên civakê winda kirine. Di vê çarçoveyê de modêla Neteweya Demokratîk ne tenê pêşniyareke bîrdozî ye; Di heman demê de, ew îdia dike ku rêyek ji xitimîna heyî pêşkêşî dike.

Ev tecrube nîşan dide ku modêl ne tenê di dema şer de, di pêvajoya amadekirina aştiyê de jî dikare bikêrhatî be. Di rewşa heyî de modêla Neteweya Demokratîk wek "herêma pîlot" li bakurê welêt namîne; dê bibe yek ji aktorên diyarker di pêşeroja welêt de. Ji ber ku sîstem li ser esasê beşdariya gel hatiye avakirin, cudahiyê naxe navbera piraniyê û hindikayiyê, nasnameyeke tenê ferz nake û destwerdana baweriyan nake.

Em niha ji bo gelê Sûriyê li ser xaçerêyekê ne: Yan dê li ser civakeke ji nû ve perçebûyî ya di bin serkêşiya cîhadîzmê de, ku berdewamiya rejîma kevin e, yan jî dê modêlên wek Neteweya Demokratîk ji bo dîtina jiyana hevpar a pir-nasnameyî, pirbawerî û piralî bin. Dê dîrok di vê çarçovê de bi ser bikeve. Wê demê mirov dikare bibêje:

Li van axan jiyaneke nû mimkun e û ew jiyan jixwe şîn bûye.

Demokratîk ne tenê pêşniyareke bîrdozî ye; Di heman demê de, ew îdia dike ku rêyek ji xitimîna heyî pêşkêşî dike.

Wateya şerê Melezgirê ji bo Kurd û Tirkan

Volqan Elî

Xweza li gorî civaka mirovahiyê pir hêdî xwe diguhere. Lê belê ev guherînên li xwezayê jî rasterast li ser civakan bandora xwe dikin. em mirov, civak jî ne bi kêfa xwe ne; ji neçarî li ber xwezayê stuxwar dibin. Werhasilî, li gorî tehlîleke dîrokî-demografîk, texrîbên 1500-2000 hezar sal berê li Asyaya Navîn ku êl û eşîrên Turanî lê dijiyan zuwabûnhişkesalî peyda dibe. Êlên Turanî yên Şamanîst (yanî kalikên Tayip û Dewlet Bahçelî ji heft bavikên xwe ve ne Misilman bûne) vê, wekî xezebeke Xwedayan-ruhên mezin dihesibînin. Û berê xwe didin aliyê xwe yê başûr, rojava û hwd. hoz û eşîrên bav û bavpîrên Tayip û Bahçelî, xwe digihînin welatê Persya, Kurdistan, Erebîstan û hwd. Lê derbas bûna li van deran wisa nabe. Pir êl û hozên Şamanîst bi qirkirinan re rû bi rû dimînin, hir de diçin vir tên, li Bîzans, li Kurdan, li Farsan, li Ereban diqelibin lê bê çare yan vedigerin bi paşde yan tên kuştin yan jî dihelin û dibin Kurd, Fars û hwd.

Di dawiya dawî de beşek êlên koçber ku li ber çema Mewarun Nehr asê mabûn (kalikê Bahçeli û Tayip), ji nişka ve biryar didin ku bibin Misilman (1043).

Piştî ku dibin Misilman, hêzên serdestên hozên Tirk, gelek xizmetawan ji Ebasiyan re çêdibe, dibin fermandar û şûrê qesrên Ebasî. Pir serhildanên demê yên gel yên şoreşgerî (Babek, Zenc têk dibin. Ji vê pêvajoyê bi şûnde ye ku hozên Tirk-Turanî li welatê Aryen, Erebîstanê bi rehetî tevdigerin. Li ser erdnîgariya Îran, Kurdistan dewletên Selçûqîava dikin.

Ruxmî vê rewşê jî ji ber ku li aliyê rojavayê Kurdistanê (erdnîgariya ku hozên Kurd lê dijiyan) Bîzansî hebûn nikaribûn derbasî vî aliyê bibin. Her çendî ji beriya vê hin begtî û dewletên Selçûqîava kiribûn jî, li van deran Kurd, Fars, Ermen û hwd. dijiyan welatê wan bûn. Aliyê rojaveyê Kurdistanê Bîzansiyên ne Misilman bûn, wisa difikirîn ku ew dikarin van deran bikin welatê Tirkan.

Li ser vî esasî, melîk-reîsê Tirk-Turanî Alparslan beg hê ji beriya şerê Melezgirê tê bi Mîrîtiya Merwanî re têkîlî datîne. Her du alî bi germahiyeke mezin nêkî hev dibin. Tê gotin mîrên Merwanî di wan serdeman de gelek nakokî di navbera xwe de dijîn. Pir caran Alarslan beg dikeve navbera wan, wan li hev tîne. Yanî di şexsê wan de têkiliyên Kurd û Tirkan di wê astê de xweş dibin.

Sal dibe 1071. Alparslan Begê serekê desthilatdariya Tirkên wê serdemê lê mêze dike ku wisa nabe! Çi nabe? Yanî temam, navbera wan û Kurdan xweş e! Kurd mêvanperwer in, cih dane wan, war dane wan... Lê dîsa jî welatê xelkê nabe yê mirov. Jixwe re dibêje, "divê em derbasî aliyê Bîzansê bin. Jixwe ew ne Misilman in. Divê em Anatoliya Bîzansî bikin Misilman, welatê wan jî bikin ê Tirkan." Alparslan Beg vê plana xwe ji Mîrên Merwanî, Cîzira Bohtanê re eşkere dike. Dema Kurd bi vê planê dihesin, qetl û qiyamet, talan û dagirkeriya Bîzans (hem jî Sasanî, Emewî û Ebasî) ya bi sed salan, hezar salan di ber çavên wan rê dîsa bi êşeke mezin derbas dibe. Van her sê hêzan ne ku tenê hatibûn talan û terşa Kurdan rakiribûn, her şer û cengê xwe jî li ser Kurdistanê meşandibûn. Wan bi hev re şer dikir, gundên Kurdan wêran dibûn, Kurd dimirin. Piştî ku Medya hilweşîbû (b.z 550) bi şûnda, Axamenîşî, Sasanî, Helen, Emewî, Ebasî, bûyîbûn xwînmijê Kurd û Kurdistanê. Êdî Kurd pir bê zar bûbûn. Ji hal ketibûn. Ku ji ber çi bû tam nayê zanîn vaye di van çaxên dawî de êdî şer û şûrê Bîzans, Sasanî û Ebasî li ser Kurdistanê kêm bibû. Lê dîsa jî xetereya dagirkeriya wan berdewam dikir. Bi taybetî ya Bîzansiyan...

Dema ku Kurdên Merwanî, Cezîra Bohtan pêşniyar-plana Alparslan bihîstin bi rojan bi şevan xew bi çavên wan neket. Ji ber ku firsendeke mezin li ber wan bû. Wê herî kêm beşek xetereya hezar salan kêm bûya. Li şûna ku artêşên dagir ên Bîzans bihatana Kurdistan bixista bin lingê xwe, wê bi Tirkan re rû bi rû bima. Di dawî de ji Alparslan re gotin 'erê'. Wê li dijî Bîzans şerekî xwînavî çêbûya. Êl û hozên Tirkmen wê derbasî aliyê Bîzans, aliyê rojavayê Kurdistanê bibûna.

Mîrê Ferqînê bi nêzîkî deh-panzde hezar şervan tevlî şer bû, mîrê Cezîra Bohtan jî bi pênc hezar şervan... Şerê mezin li Melezgîrê di 26 Tebaxa 1071'an de çêbû. Li gorî dîroknas dibêjin, Alparslan quweteke sih hezar leşker xistibû vî şerî. Dîsa artêşa Bîzansî jî zêdetirî sed hezar leşker xistibû şer. Fermandarê Bîzansî Romen Diyojen bû, yê hêzên Misilmanan jî Alparslan bû. Di meydana şer de Bîzansî têk çûne, quwetên Misilman bi ser ketine.

Niha piştî bi hezar salî em encamên vî şerî difikirin. Di wê serdemê de çi bûye, wekî destkeftên vî şerî... êl û hozên Tirk di Melezgirê de derbasî Anatoliya Bîzansî bûn. Wê derê ji xwe re kirin war û welat. Bi sedan sal li wir man êdî bûne ji wê derê... bi saya vî şerî... di wê serdemê de deskefta Kurdan çi bûye? Li ber êrîşên Bîzansiyan ji eşîrên Tirk bendek-dîwarek çêbûye... Jiyana Kurd û Kurdistanê demeke pir dirêj ketiye bin ewlehiyê.

'Nameya Rêber Apo perspektîfên xwenûkirin û rêxistinbûnê ye'

Endamê Tevgera Ciwanên Şoreşger ên Sûriyê Dilyar Îbrahîm teqez kir ku nameya Rêber Apo ya ji bo ciwanan perspektîfên jinûverêxistinkirin û bilindkirina têkoşînê ye û got: "Divê ciwanên serdemê layiqê pêvajoyê derkevin."

Esma Mistefa/Qamişlo

Rêber Abdullah Ocalan di pêvajoya nû de gelek nameyên girîng ji bo tevahî gelên azadîxwaz, gelê kurrd, jin û ciwanan şandin. Herî dawî jî nameya ku ji bo ciwanên kurd rêkiribû ji aliyê ciwanên çar perçeyên Kurdistanê ve hate pêşwazîkirin. Girêdayî vê mijarê endamê Tevgera Ciwanên Şoreşger ên Sûriyê Dilyar Îbrahîm bersiva pirsên Rojnameya me da.

-Bi banga Rêber Apo a aştî û demokrasiyê re gelek geşedan rûdan, tevgera ciwanan li Bakur û rojhilatê Sûriyê ev yek çawa pêşwazî kir?

Banga Rêber Apo a ji bo aştî û civaka demokratîk bangakî dîrokî bû û pêwîst e gelên azadîxwaz li seranserî cîhanê weke banga serdemê pênase bikin. Rêber Apo di vê bangê de ne tenê bal dikşîne ser danîna çekê û divê em tenê wisa lê nemeyzînin. Ji ber ev yek ji bo çareserkirina tevahî alozîyan e, bi tayebet çareseriya li tevhahî Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê, her wiha çaresekirina doza gelê Kurd di gişt cîhanê de ye.

Bi vê bangê Rêber Apo ew name da hemû cîhanê ku di hundir jiyankirina ewqas kaos, alozî û şerên kî di Rojhilata Navîn û derveyî wê de têne jiyankirin, ji şerê çekdarî vegerîne qonaxa danûstandin û adeletê ku li ser pirensîpên demokrasiyê bêne çareserkirin. Tevgera ciwanan jî ev bang bi vê şêwazî pêşwazî kirin weke ku ev bang ji bo me talîmat û perspektîvin, em tevdigerin. Ev bang

tê wateya xwerêxistinkirin, xwe li gorî pêvajoyê amedekirin e. Em nikarin bêjin ku weke dane pênasekirin ku tenê tevgera Azadiyê çek dayîne û normal jiyankirin bê meşandin. Helbet ev yek nayê kirin û nehat kirin jî, heyanî ku qonax gişt vedigera qonaxa danûstandin û aştiyê.

Bi taybet Tevgera Azadiyê ji bo guhartin û xwenûkirinê re vekiriye û li gor pêvajoyê stratejiya xwe dide guhartin. Me jî xwe bi vê bangê re careke din xwenûkir, rexnekir, xwebirêxistin kir. Em ancax xwebirêxistinkirinê vê bangê pêkbînin û bigihînin armanca avakirina civakeke demokratîk, ekolojî, azadîxwaziya jinê. Tevahî ciwanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi vê germahiyê û bi vê rihî ev bang pêşwazî kirin.

Nameya Rêber Apo a ji bo ciwanên kurd şandiye bûn çawa dinirxînin û divê ciwanên serdemê bi vê nameyê re xwe çawa birêxistin bikin?

Nameya Rêber Apo a ji bo tevahî ciwanan rêkiriye, destpêkeke nû a têkoşîn, rêxistinkirina ciwana ye û bargiraniya li ser mile me ye. Em jî li ser wê esasê careke din soza têkoşîn, berxwedanî û xwenûkirinê nû dikin. Em ciwanên kurd û hemû ciwanên girêdayî ramanêb Rêber Apo bi vê nameyê re em bi awayekî rexnegir nêz xwe dibin, her wiha ji berjewendiyên xwe yên tekekesî durketin nêz dibin û bi xwebûnê pêşwazî dikin. Em careke din têkoşêna xwe zêdetir bikin û weke ciwanên serdemê û yên azadîxwaz riya ku rêbertîî nîşanî me daye bernadin û heyanî serkeftnê berdewam bikin. di heman demê de yek ji xalên herî sereke ew jî balkişandina ser xwetrêxistinkirinê. Ew jî li ser asta bakur û Rojhilatê Sûriyê û tevahê xaka Sûriyê ku çawa ev rêxistin ji dema derbasbûna Rêber Apo her xwe rêxistin dike û têkoşîna azadiyê dide meşandin, divê ji niha û pêve û bi hemdemiya bidestxistina ewqas destkeftî em vê astê bilindtir bikin û bibin pêşeng ji hemû ciwanên cîhanê re. Rêbertî her çiqas mezinkirina asta têkoşînê ji me daxwaz bike, em ê deh qat ji wî zêdetir lixwe vegerrin û xwe rêxistin bikin. Em vê nameyê weke barekî giran li ser xwe dibînin weke nameyekî serdemî û dîrokî ji bo xebatên me û hemû tevgerên ciwanan dinirxînin.

Di heman demê de ji gotina Rêber Apo a ku weke felsefeyekê ye ji bo tevgera ciwanan a "Me bi ciwantî dest pê kir û emê bi ciwantî biserbikevin" ev nîşan dide ku Rêber Apo ciwanekî çawa li gorî pêvajoyê ji me dixwaze. Emê her tim nirxandin gotinên Rêbertî weke perispektîv bigrin dest û li ser wê bingehê tevbigerin. Divê kesayeta ciwanê kurd bibe bingeha avakirina Koonfedralîzma Demokratîk û Koonfedralîzma Ciwanan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û hemû cîhanê. Bi vê rengî em li xwe vedigerin bi kesayeta ku her tim ciwan li rastiya rêxistinbûyînê û azadiyê digere. Her wiha berdewamkirina têkoşînê ji bo misogeriya azadiya fîzîkî a Rêbertî, ji ber dem dema ku ev ronahiya ku di îmraliyê de di bin siyaset û pilanên dijmin de hatiye girtin, êdî derkeve û bi mafê xwe jiyan bike ye.

Meşa ciwanan a ber bi Amarayê ve ji aliyê ciwanan hat destpêkirin, hûn li Rojavayê welêt ji bo azadiya fizîkî a Rêber Apo xebatekî çawa dimeşînin û banga we ji bo ciwan çi ye?

Belê; cihê şanazî û serbilindiyê ye ku Rêber Apo bi tayebt ji bo ciwanên ber bi Amarayê ve meşiyan e name rêkir. Meşa ji bo Amarayê meşa ber bi ronahiya azadiya gelan e. Amara ji bo me qubleya azadiyê ye. Dibe ku em ciwanên Rojavayê welêt nikaribin tevlî meşa ji bo Amarayê bibin e, lê her tim çav û dilê me ber bi wir ve diherike û em ciwanên Bakurê Kurdistanê ji dil silav dikin.

Em dibînin ku di van demên dawiyê de ne tenê ciwanîn kur, ciwanên welataên derve weke ciwanên Emerîkayî, Efrîqayê, Kenedayê, li Asyayê ji bo azadiya xwe bibînin û rastiya pergalê nas bikin; îdeolojiya Rêber Apo dixwînin û lêkolîn dikin. Em jî li ser esasê parastina destkeftiyên şoreşê, mosogerkirina doza azadiya Kurdistan, xeta me ya sereke ew jî ji bo azadiya fîzîkî a Rêbertî karkirin e. Nameya Rêbertî jî nameya vejîn û rêxistinbûyînê ye divê em jî layiqî wê yekê derkevin.

Li ser van bingehan em banga ciwanên azadîxwaz, ciwanên kurd dikin ku li gorî rihê serdemê û banga Rêber Apo tevlî meşa azadiyê bibin û pilanên dagirkeriyê têk bibin.

Tirkiyê li Rojhilata Navîn çavkaniya paşverûtîyê ye

Zekî Bedran

Tirkiye welatek e ku li Rojhilata Navîn xwediyê armancên berfireh yên ku xwe dispêre berjewendîyan e. Ji ber ku hinceta li dijî kurdan şer dikim, artêşa xwe şand Iraq û Sûriyê. Herêmên girîng yên Başûrê Kurdistanê di bin dagirkeriya leşkerî de ne. Bi dehan baregehên leşkerî hatine avakirin. Her wiha dêhatiya Iraqê nikarî bû ku baregeha leşkerî ya ku li Başîqa hatibû ava kirin bide vala kirin; Berovajî vê, Tirkiyê xwe li wir bi awayekî mayînde dagirkeriya xwe berfireh kir. Xebatên Tirkiyê yên li Başûrê Kurdistanê û Iraqê tenê bi van mijaran re jî sînordar nîne. Li wir alîkariya tirkmenan hatiye kirin û li ser bingeha nijadeperestî û paşverûtîyê tên perwerdekirin û birêxistinkirin. Li Kerkûk û Iraqê jî Tirkmenan ji bo armancên xwe bi kar tîne. Başûrê Kurdistanê jî veguherandiye bazareke aborî ya vekirî. Her wiha xebatên xwe yên li ser Suniyan jî didomîne. Di heman demê de jî, gelek caran destê xwe dixe di nav karûbarên navxweyî yên Iraqê de jî.

Ji bo ku Kurd nebin xwedî statu û hêz, artêşa Tirk li Sûriyê destê bi dagirkeriyê kir. Bi gelek hêzan re ku DAIŞ jî di nav de bû hevpeyman çêkir. Hêrêmên weke Efrîn û Serêkaniyê hatin dagirkirin. Li dijî Kurdan qirkirina etnîkî dan destpêkirin. Her wiha parazvaniya El Nûsra kir jî bo ku bi hêza leşkerî ya ku li Idlibê bi cih kiribû, weke dewletekê were rêxistinkirin. Bi pêvajoya Astanayê re li dijî kurdan eniyek ava kir. Rûsya û Îran rawestand, piştgirî da HTŞ û di dawiyê de bû sedema hilweşîna rejîma Baas û paqijkirina Îranê ji Sûriyê. Hebûna Rûsyayê li Sûriyê di metirsiyê de ye û qada wê ya tevgerê gelekî teng bûye. Piştî ku rejîma Baas hat rûxandin, dewleta Tirk bi HTŞ'ê re lihevkirinek çêkir û li dijî Kurdan û Rêveberiya Xweser êrîşên piralî dan destpêkirin. Şehba, Til Rifat û Minbic ketin destê wan. Êrîşên wan li Tişrînê hatin şikandin. Bi mehan e êrîş dikin. Armanca wan ew bû ku Rêveberiya Xweser bi gişt têk bibin û kurdan di qirbikin û komkujîyan de derbas bikin. Tirkiye ji bo ku HTŞ bi tevahî li Sûriyeyê serwer bibe dixebite. Ev desthilatiya nû ava kir, xist bin serweriya xwe. Karmendên xwe li wezaretan bi cih kir. Damezrandin û perwerdekirina artêşa Sûriyê pêk tîne. Bi vî şêwazî, ew plan dike ku HTŞ tevahî Sûriyê bandor û serweriyekî demdirêj ava bike. Hewl dide dewleteke pir navendî û li bingehêkî olî birêxistîn bike. Li şûna makezagoneke azadîxwaz û demokratîk, bi tevahî piştgirî kir ku ji bona zagonên demkî ya paşverû, zordar,yêkdest ku ol weke rêbaz digirt piştevanî kir. Rayedarên wan dan zanîn ku ew di her warî de piştgiriya mileta demkî ya ku niha hatiye damezrandin dikin. Vê hikûmetê tevî hemû bendewarî û hişyariyan hemû pêkhate û komên rêxistinkirî yên Sûriyê li derve hiştin. HTŞ'ê bi tena serê xwe hikûmet ava kir.

Tirkiye ji herêmên ku li Sûriyeyê dagir kiriye venakişe. Di vê mijarê de keseki ku zextê lê bike û tîne rojevê nîne. HTŞ ne di rewşek de ye ku devê xwe veke. Tirkiye êdî jî vê yekê têr nabe. Li Sûriyê li ser avakirina baregehên leşkerî yên nû dixebite. Di van rojên dawî de êrîşên esmanî yên Îsrailê li erdnigariya Sûriyê zêde bûne. Hat diyarkirin ku ev êrîş bi avakirina baregehên nû yên Tirkiyê ve girêdayî ne. Îsrail li dijî avahiyên li Sûriyê armancên xwe yên girêdayi berjewendiyan zêdetir û berfirehtir bike. Tirkiye li dijî Îsrailê tevdigere. Hakan Fîdan got, "Em naxwazin bi Îsrailê re rû bi rû bimînin." Lê Îsraîl dî van mijaran de zelal û bi biryar tevdigere. Dixwaze hemû binesaziyên leşkerî ya Sûriyeyê ji holê rake. Li dijî artêşeke nû û bi hêz derdikeve. Di vê mijarê de bi Tirkiyeyê re hevrikiyê dikin.

Tirkiye li Rojhilata Navîn gavên xwe zêdetir diavêje. Hişmendiya Erdogan bi HTŞ û Îxwanan re li hev dike. Li dijî dewletên cîran hêzê bikar tîne û leşkeran bi cih dike. Ne gengaz e ku hem daxwaz zêdebin û hem jî yên din re rûbirû nebin. Raste Îsraîl wek Iraq û Sûriyê ne dewleteke lawaz e. Lê Tirkiye naxwaze dest ji Sûriyê jî berde. Erdogan dê heta dawî rîsla xwe bileyiz e. Di vî warî de Sûriye jî wê bibe çavkaniya alozîyê. Tirkiyê gotin cih de be, li herêmê bûye çavkaniya gengeşî û alozîyê. Divê ev rastî neyê paşguh kirin.

Ji bo têkbirina tevgerên civakî û demokratîk dixebite. Ew nijadeperestîyê geş dike û piştgiriya rejîm û tevgerên olperestî dike. Bêdengiya wan a li hemberî komkujiya li dijî Elewiyan û piştgiriya wan a ji bo HTŞ'ê ji vir tê.

Hewldanên "Xapandina hezar salî"

Farûk Sakik

Dema ku di sedsala 11'emîn Tirk ji çolên Asya Navîn pêlên koçberiyê dan destpêkirin û bi pêşengiya Selçûkiyan hatin ber deriyê Anataoliya, li vê derê Kurd nas kirin. Gelê Kurd li vê axê, ji dîrokê re malovanî kiribû. Civakeke qedîm bû. Herdu gel, bi hev re li wê erdnîgariyê destê bi jiyaneke aştiyane kirin.

Dema ku Osmaniyan mîrasa Selçûkiyan girt, di destpêkê de bi Kurdan re di nav danûsandinê erênî de tevgeriyan. Mîrektiyên Kurdan li herêmê serbixwe bûn. Kurdistan di warê aborî-bazirganiyê de herêmeke stratejîk bû. Ev yek bala Osmaniyan kişandibû. Di sedsala 16'an de di dema şerê Osmanî û Sefewiyan de têkiliyên herdu gelan dîsa stratejîk bû. Lê bi sal û demê re, dema ku Tirk dîbûn xwedî hêz, êrişî Kurdan kirin, an jî xiyanetî Kurdan kirin. Di destpêka sedsala 19'emîn de dema Osmanî, bûn xwedî hêz midaxaleyî mîrektiyên Kurdan kirin. Ev bû sedem ku Kurd destê bi serhildanan bikin. Serhildana, mîrektiya Mîr Bedirxan jî ji van îsyanan yek bû. Em vegerin îro. Dîsa dor li wan hatiye tengkirin. Îsraîl gefan dixwe. Di dîzaynkirina Rojhilata Navîn de talûkeyeke mezin lî pêş wan e. Dîsa wek dîrokê xwe spartin Kurdan. Dîsa behsa biratiya Kurd û Tirkan a hezar salî dikin. Ev car Kurd jî hişyar in. Kurd îroj behsa xiyaneta wan a hezar salî dikin.

Li ser stratejiyek, li ser aşitî û civaka demokratîk li hev kirin. Pêvajoyek-serdemek nû destpê kir. Peyama Rêber Apo ne tenê di nav Kurd û Tirkan de heyecanek çêkir, di heman demê de li cihanê bi erênî hat pêşwazî kirin. Lê di demeke wiha de li Rojhilata Navîn de hin hevsengî hatin guhertin. Li Sûrî dema HTŞ bû desthilat, Tirkiye ev pêvajoya nû da aliyek û berê xwe da Sûriyê. 3 cengewarê xwe Hakan Fîdan, Îbrahîm Kalin û Yaşar Guler derbasî Qesra Colanî kir. Ev 3 kes demên dirêj bi HTŞ û Colanî re hevaltî kiribûn. Li Şamê bûn û dixweştin bi Colanî re li dijî Kurdan siyasetek qirkirinê bidin destpêkirin. Daxwazek wan jî ew bû li Sûrî bargehên leşkerîava bikin.

Serdema Beşar Esad hat bîra wan.

Di axa Sûrî de bê aşteng li her derî hebûn. Di axa Sûrî de 'ala' wan hebû. Kurd wek terorîst û dijminê xwe îlan kiribûn. Koçberên Sûrî li dijî Ewrûpa di siyaseta xwe de bi kar anîbûn.

Texmîn dikirin bi Colanî re ev yek zêdetir pêş keve. Lê nebû.

Îsraîl siyaset-lîştika wan dîtibû û êriş kir. Baregehên dixweşt li bi cîh bibin heroj dihatin bombekirin. Erdogan wêrekiya xwe ya li dijî Kurdan evcar nikaribû bi kar bîne. Êdî nikaribû ji Îsraîl re bibêje; "Em ê şevek ji nişkeve werin." Dema ji bo Erdogan peyva diktator bi kar danîn, newêribû bibêje "Eyyyy Îsraîl". Bi tenê digot 'em vê peyvê red dikin'. Herkesî henekê xwe bi wan kir.

Şevek ji nişkeva, neçûn Îsraîl, lê çûn Amerîka (Hakan Fîdan). Li vêder jî encamek negirtin û carek din vegeriyan cem Rêber Apo. Di destpêkê de di çanda bapîrên xwe ya xapandinê de israr kiribûn.

Îroj êdî bawerî anîn ku nikarin careke din Kurdan bixapînin. Rêper Apo evcar baş nas kirin. Ev rêber û ev gel nedişibiyya Kurdên hezar sal berê. Neçar in ku xapandin û xiyaneta hezar salî, deynin aliyekî rastiya berdewam nû bibînin-qebûl bikin. Ev şansê dawî yê ku Kurd didin wan. Divê jî vê biryara Rêber Apo re rêzdar bin. Careke din di salonên Qesra Şamê de, li dijî Kurdan, li hevkaran negerin. An jî wê aqûbeta bapîrên xwe Osmaniyan a destpêka sedsala 20'an bijîn.